

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar ( 128)* *Sal 22* *Avdar 2017 z - 2629 k* *Buha (75)L.S*


# Ji Xwîna Pakrewanan re ... Dilsoz bin!

**Desteya sernivîser**



Gera Cinêvê ya pêncan jî bi dawî bû û tiştek li derbarê çareserkirina qeyrana Sûryê encam neda. Nêrevan û şopînerên rewşa guftûgoyên tabloyeke reşbîn û lihevketî ji heyama Cinêvê û encamên wê re xuya dikin, û dibêjin ku sedema sereke ji girêfkirina guftûgoyan re jî destên derve ne. Ew destina jî kûr derbas nava şerê Sûriyê û tevahiya rewş, pirs û qeyran bûne, û çareseriya wê jî bi pêkanîna berjewendiyên xwe yên pirerengî ve girêdane, lewre jî ne xema wan e ku pirojeyên xwe yên taybet bi xwîna gelê Sûryê û li ser pişta wî pêk bînin. Di van heyaman de, rijêmê û alîgirên wê û rikberî û pişgirên jî her ku şer dirêj û germ dibe, bêtir har û hov dibin û herwiha derfetên çatreseriyeke nêzîk û dadmend dûr dikeve. Wekî ku rijêm û çekdarên wê, û rikberî jî bi hemî beşên xwe ve, bêhna xwînê pê xweş bûye, hêrsa kîn û tolvedan kûr bûye; wekî ku wan gel û welat ji bîr kirine, û tenê bidestxistina destlatê bûye xem û armanc.

Sedema destpêkê û sereke ji tevgerana gelê Sûryê ……… ❷

---

## Doseya Çalakiyên Boneyên Avdarê

Çendî heyva avdarê,heyva xişim û bêtaran, heyva şîn û xemgîniyê ye, ewqas jî heyva şahî û berxwedanê ye. Li Avdara Îsal jî, xelkê me yê Kurd li seranserî cîhanê rabû ser piyan û xwe pê da naskirin, çi di(8)ê Avdarê roja jinê ya cîhanî de, çi di (12,16) an de, û çi jî di (20 û 21)an di Cejna Newroza pîroz de. Ji wan çalakiyên ku gelê me pê rabûye, çalakiyên Partiya Yekîtî Ya Demokrat A Kurd li Sûriyê bûn. ……... ❼

## Rêzdar Entonyo Gutêrêz Çû Seredana Herêma Kurdistan Îraqê

**Rozad Elî**

Li roja 30î heyva Avdarê, sekretêrê giştî yê Yekîtiya Netwan Entonyo Gutêrêz bi seredaneke fermî gihîşt Herêma Kurdistanê û ji hêla serokê herêmê rêzdar Mesûd Barzanî ve hat pêşwazkirin. Piştre civîneke fermî di navbera her du aliyan de li dar ket. Li gora …….. ❽

## Silavek ... Ji Kobaniya Qehreman

**Arif Hiso**

Piştî nêzîkî sê salan ji bobelat û berxwedana Kobaniyan a gewre, û piştî ku çembera dorpêçkirina dijwar ji ser wê hate şikandin, û çûnhatina di navbera Kobaniyê û Cezîrê de serast bû, kobanî li bendê bûn û hîn jî li bendê ne ku rewşa jiyana xelkê wê yê qehreman baştir û hêsantir bibe. Lê mixabin li bervajî wê, hin biryarên bûye. ………❻

# Hişyarî Gerek e

Memê Alan

Weke em dizanin, nexwaşî, derd û kul pir reng û cûre ne, nexwaşî bi mirov, dewêr, nawir, dar û ber, çawîr û çîmen,…û civak û miletan jî dikevin, û ew hertim ji derve ve derbas hundirê govdeyê giyanwer, civak û gelan jî dibe. Çendî tendurustiya govde ne baş be, berevaniya wî li hember nexwaşiyan kêm be, ewqas nexwaşî kane wî zû bide bin xwe û lawaz bike. Dema nexwaşî bi govde dikeve metirsiya wî li ser ji metirsiya êrişên derve yên ku bi awakî aşkere û rûbirû bi ser de werin pirtir dibe û ger mirov hajê neke wî tune dike. Gava mirov nexwaş dibe ,bijîşk wî derman dike, bijîşkê beytera jî lawir û dewaran derman dike, endezyarê çandiniyê jî dar û ber, geya û keskayiyê derman dike, û dermankirina nexwaşiyên civakî stubariya rewşenbîr, siyasetvan, partiyên



siyasî, dezgehên civakê yên sêvîl û dewletê ne. Di vê mijarê de, em dixwazin roniyê bidin ser hin nexwaşiyên giran - ewên ku ji berê paşê ve xêrnexwazên Kurd û dagîrkerên Kurdistanê bi hemî kanînên xwe li ser kar dikin, da ku perçebûnê di nav gelê me de kûrtir bikin, ku carê bi şêwe û rengekî (ezeziya kesayetî, malbatî, êltî, eşîrtî,…) serî di civaka me de hildidin, û di pêvajoya xebat û têkoşîna me de bûne sersedema şûndemayîn, jidestdana destkeftiyan û binketinê .

Di vê dema me ya niha de, em dibînin ku xêrnexwazên gelê me (serdefter rijîmên dagîrker ji Kurdistanê re) bi alîkariya Kurdên dûrebîn çandeke çewt û metirsîdar bi navên (partîtî, eydolocî, olî û bineolî) li pêş Kurdayetiyê di civaka me de diçînin, ew jî roj ji rojê pirtir gol vedidin, reh û tamarên xwe di kûraniyê de berdidin, nakokî û cudahiyên navxweyî kûrtir û berferehtir dikin.

Ev ton çanda nexwaş, çandeke kirêt e, dema pir fereh bibe, derd e, û bê derman e, ew perçebûnê pirtir û kûrtir dike, û dema ku ew li ba mirovê Kurd şûna kurdeweriya wî bigre, civakê lawaz dike û metirsiya wê li ser pêşeroja me ji metirsiya hêzên teror û rijîmên dagîrker xerabtir e. Ev diyarde di nav me Kurdan de her dere pir dibe û beşek ji gelê me berve wê dişimite. Eger ev rewşa weha berdewam bibe, tirs ew e, ew bibe wek nexwaşiyên vegrok.

---

## Ji Xwîna … Dûmahîk

re pirsa maf, rûmet û azadiyê bû. Pirsa gelê kurd li Sûryê jî yek ji wan egerên bingehîn bû. Lê mixabin piştî ewqas xwîn, êş û wêranî, diyar dibe ku ew armancên rewa bi aliyekî de hatin têvedan û berjewendiyên destlat, olî, bineolî, navdewletî û wekî din jî li ba her du aliyê keftleftê, rijêm û rikberî , şûna wan girtin.

Lê tiştê herî balkêş, ji pirsên ku ji bîra her du aliyan neçûye, bi giranî dane ser, li ser digihên hev û dixwazin wê tune bikin, pirsa gelê Kurd li Sûryê ye. Ew di warê wê pirsê de hîn li ser çanda xwe ya nijadperestî û helwesta mandelkirinê mane û dimeşin. Wê nêrînên xwe ya nerênî û nijadperest li ser masa guftûgoyan û di alavên ragihandinê de jî eşkere û bê şerm xuya dikin. Helwesta rikberiyê ya rast di tenga pirsa kurdî re jî, di Cinêv-5 de aşkere û tazî xuya bû. Wan ne tenê belge û nêrîna nûnerê Encûmena Niştimanî ya Kurdî(ENKS) li derbara çareserkirina pirsa kurdî di desteya gufûgoyan de nepejirand, lê radestî nûnerê YN jî nekirin.

Di van rojên dîrokî de, pir pêwîst e û ji hemî aliyan tê xwastin ku bi hev re û bi yekdest berevaniya xwe bikin, bi şandeke kurdî ye hevbeş jî biçin ber maseyên guftûgoyan û bi navê gelê Kurd deng bikin. Ew ne daxwaz û hêviya gelê Kurd tenê ye, dewletên mezin ku doza kurdî rewa dibîbnin jî li wê bendê ne û doza yekîtiya Kurdan dikin û rewşa wî dişopînin. Rastî ew e, ku aliyekî bi tena xwe, çiqas xurt be jî, nikane bi tena xwe nûnertiya gelê Kurd bike. Tenê nûnertiyeke giştî, yekgirtî û hevbeş kane li ber maseya Cinêvê û bilî Cinêvê jî rûne, sîngê xwe bikute.

# Ji Hevdîtineke Giring

# Bi Mamoste Mihidîn Şêx Allî re

**Wergerandin ji Erebî:**
**M. Elî**

Sebaret rewşên ku Sûrya û herêma Rojhilata Navîn tê re derbas dibe, Malpera Telvzona NRT -beşê zimanê Erebî- hevdîtinek bi sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê rêzdar Mihidîn Şêx Allî re kir û di malpera xwe de belav kir. Tiştê balkêş ew bû, ku ew ji hêla hezaran kes ve hate dîtin û xwendin. Rêzdar M.Allî di bersivên xwe de li ser xalên giring ku Sûryê û Kurd tê re derbas dibin de rawestî. Ji ber giringiya nêrîn, şirova û naveroka wê, û ji ber ku hevdîtin dirêj bû, me beşek ji pirs û bersivan ji xwendevanên Newrozê re vebjartin û wergerandin zimanê dê:

***Pirs**: Pişt çend salan ji qeyrana Sûryê, pêşbîniyên we li ser paşeroja vî welatî çi ne, û çarenûsa herêmên kurdî di lihevhatina dawî, çi siyasî û çi leşgerî, ya rewşa sûrî de, wê çwawa be?*

- Qeyrana Sûryê qeyraneke bingehîn û piralî ye. Tundî û tundiya dijber a derdest li van şeş salên borî, bi destêwerdanên derve re, û serhişkiya rijêmê û girtina wê bi çareseriya ewlehîleşkerî ya kirêt, qeyran kûrtir û pirgirêk kir û gel û welat xistin gergerîna şerekî wêrankar. Ew helwesta rijîmê ya hişk, teqîneyên xwekujan, û bawerî û pilanên komên îslama siyasî bi serkêşiya cîhadiyan û mejiyê wan yê tolvedêr, dihêlin ku metirsî berdewam bin. Nemaze jî ew nofa cîhadiyan, sûdê ji heyam û komelgehên xwecihî ku bi fetwe û çêrokan derî li ber raman û jîrbêjiya durust girtine, dibînin. Bi ser de têvedana ji derdoran de, û têkelhevbûn û xurtbûna nakokiyên herêmînavdewletî jî dikin ku pêkhatina aştî, aramî û serdariya zagonên şaristanî di demeke nêzîk de li ser tevaya xaka Sûryê pir dijwar be. Ji ber ku serketina leşgerî ne li ber desta ye, û çareseriya siaysî jî- di gel rêzezincîra daxuyanî, civînên Cinêvê û Istana û kedên şandeya navnetewî yên berdewam- wê ta demeke ne diyar velukumin û encamê nadin.

Sebaret beşê duyem ji pirsê ku girêdayî çarenûsa herêmên kurdî li Sûryê ye, ew bi rewş û paşeroja Sûryê ve girêdayî ye, çiqas Sûryê bi xêr be, em jî ewqas bi xêr in.

***Pirs**: Şerê li dijî têrorê û rêxistinên gawirkirinê li Îraqê û Sûryê germ e, hêzên Pêşmerge û Yekîneyên Parastina Gel jî tê de beşdar in, berjewendiya Kurdan û destkeftinên siyasî ji Kurdan re di vî şerî hene?*

Dijîtî û hovîtiya rêxistinên gawirkirinê di tenga Kurdan û doza wan a netewî re, û neyartiya wan ji nirxên şaristaniya mirovatiyê û têgeha pêkbejiyanê re, dike ku hêzên kurdan, çi yên



siyasî û çi xweparêzî yên çekdar (Pêşmerge- YPG) bê dudilî di rûyê DAIŞ de bisekinin, û bi zîrekî li gel Hevebendiya Navdewletî ji bo têkbirina wê bixebitin, çi li Mûsila Îraqî û çi li Reqaya Sûrî. Ji ber ku têkbirna pirojeyên rêxistinên gawirkirinteqandinê û li pêşiya wan Rêxistina (DAIŞ) destkeftineke siyasî û sinciyane ye. Berjewendiya Kurdan jî di hilanîna astangan ji pêş çereserkirina doza wan a netewî ya mirovane de ye. Komên îslama siyasî ku bi şufenîzmên tund ên netewên serdest re bûne yek, bi hev re bûne astengine mezin û berdewam di riya bi destxistina Kurdan ji mafên xwe yên netewî û demokrat de, û ji gel û pêkhateyên Sûryê yên din re jî li Sûryê, Îraqê û tevahiya herêmê jî wiha bûne.

***Pirs**: Li vê dema dawî, nakokî û neliheva ku li Herêma Kurdistanê heye, fere bû û derbas Nava Kurdên Rojava jî bû, hêzên Roj û Hêzên parastina Şengalê bi hev re rûbirû bûn, û ji ber ku nakokiyên mezin di navbera wan de hene, guman heye ewê di demeke ne dûr de li hember hev rabin û şer bikin, win çawa rewşê dinirxînin?....* ⓫

# Bi yekîtiya me NEWROZ xweştir û geştir dibe

Newafê Bişar



Ta roja îro, tu lêkolîn û belgeyên pêbawer sebaret rastiya Cejna Newrozê ji bilî hin çîrok û efsaneyên di hin pirtûkên dewletên dagîrker de hatine çapkirin, tiştekî din nehatiye pêşkêşkirin. Lê, di vê babetê de, hin jêderên dîrokî tekez dikin ku padşahekî çavsor û xwînrêj bi navê Ezdehak rabûye, gelên îranî (Kurd, Faris, Afxan...û hwd) ji ber sitem û zordestiya wî ketine rewşeke pir xirab, û jiyana wan bûye dojeh. Li hemberî vê sitema bê sînor, û ji ber ku pişka gelê Kurd ji vê zordestiyê ya herî mezin bû, têkoşerekî Kurd î zana, xweşmêr û dilêr bi navê Kawayê Hesinkar serî hildaye, xortên Kurd li dor xwe civandine, ew bi çek û rêxistin kirine, û li dijî kela zordariyê şoreşek lidar xistiye. Roja 21ê Avdarê, şoreş bi ser ketiye, Ezdehakê xwînxwer hatiye kuştin û li hawîr bûye şahî, bûye dîlan û sema, agirê serfiraziyê li deşt û li ser zinaran, ser kûpên çiyayên bilind weke nîşana azadiyê hatiye dadan. Rojeke nû, rojek bê zulm û zor di jiyana gelên deverê de dest pê kiriye, ji ber wê hindê ye ku navê wê rojê bûye NEWROZ.

Derdora 300 milyon kesî ji gelên cîhanê vê cejnê li gora kelepûra xwe pîroz dikin, hin bi navê Cejna Buharê û hin jî bi navê Cejna Sersalê, şahî kernevalên gelêrî li dar dixin .

Di vî warî de, hêjayî gotinê ye ku li ser destpêşxeriya çend dewletan (Afxanistan, Albanya, Îran, Turkiya, Mekedonya Yogislavî, Hindistan, Tacîkistan, Qîrxîzistan, Kazaxistan, Azerbeycan û Turkmenistan), sala 2010an, Komela Giştî Ya Yekîtiya Gelan biryara 64/253 standiye ku li gora wê, roja 21ê Avdarê ji her salê cejna NEWROZê ye, û Newroz bibe cejneke cîhanî û navnetewî.

Di bîrhatina vê cejna pîroz de û ji ber ku Newroz cejneke netewî ye û bi xebat û azadiya gelê me ve girêdayî ye, pêwiste em sernavên sereke yên rewşa rêzanî ya îro di ber çavan re derbas û şirove bikin.

Li Rojhilata navîn, gelê Kurd bi hejmara xwe ya nêzîkî 45 milyonî ku li ser xaka bav û bapîrên xwe dijî, di navbera çar dewletan de hatiye parvekirin, ew toşî hemû reng û cûreyên çewsandin û bindestiyan bûye, di welatê xwe de dîl û bê rûmet maye. Tevî ku li dirêjahiya dîrokê wî bi qehremanî li ber xwe daye, bi dehan şoreş û serhildan pêxistine û bi sedê hizaran cangorî li ser rêya azadî û serbestiyê pêşkêş kirine jî, lê mixabin ji ber hin sedemên hundirîn û hine herêmî û navdewletî, ew bi azadiya xwe şa nebûye, û her ew hesreta giran di dilê xebatkarên wî de maye, û çarenûsa wî di destê biyaniyan de maye.!

Lê, divê em têbigihên ku îro dem hatiye guhertin, rê û derfetên fireh li pêş Kurdan hatine vekirin û dûzkirin, nexşeyên nû ji devera me re li gora berjewendiyên dewletên mezin têne amadekirin. Ev ji hêlekê, ji hêla din ve jî, bi saya berxwedan, mêrxasî û qurbaniyên şervanên Kurd (Pêşmerge, YPG û YPJ) ku bi xwîna xwe ya buha berevanî di ber axa welatê xwe de kirine, parastine, terora cîhanî (Daiş) û hevalbendên wê têkbirine û dane bezandin. Û tevî hemû dijminatî û pilanên ne mirovane yên dewletên ku welatê me parçe kirine, nemaze dewleta Tirkiyê, ewa ku bi şev û rojê ji bo tunekirina Kurdan dixebite, bê westan şerê hebûna wan dike, û dixwaze li hemberî raya giştî hêzên Kurd bi terorê bi nav bike. Lê, ji ber ku têkilî û peywendiyên wê bi rêxistina terorist re aşkere bûne, nema

……... 11

# Karê Hevbeş....Asteng û Pirsgirêk

**Nûşîn Bêcirmanî**



Ji despêkê de, di xwezaya xwe de mirov li hev dicivin, bi hev re karan dikin bo ji metirsiyan xwe biparêzin, çi serma, bahoz û baranan bê, çi li hember cinawirên hovan e yên jiyana mirovan dikin bin gefa xwe de, be; Bi hev re nêçîr dikirin, şikeftên xwe tekûz dikirin û li hemberî bobelatên xwezayê radiwestiyan....Ev dîroka dûr û dirêj, ji qonaxa nêçîrê, kedîkirina cinaweran, şivantî, çandinî û herweha qonaxên din ta îro roj, ev şaristaniya ku mirovayetî gihayê de, bê guman ji encamên karê hevbeş e yê di navbera mirovan de ye.

Karê hevbeş, bihtir ji karê kes, komele, partî û saziyekê ye, ev rengê kar, hewcedarî kes, partî, milet û dewletan e , bo bicîkirina armancên hevbeş di navbera tevan de; armanc bi xwe jî dibe demkî be an stratecîk be, bo guhertina jîwerê ku tê de dijîn, bal bi xweşî, şahî û kameraniyê ve.

Di dîroka tevgera Kurdî de li rojavayê Kurdistanê, mînakine berçav û balkêş ji alavên karê hevbeş hene, di qonaxin giring de hatin damezrandin, çi demkî bin an jî qonaxane bin, tim jî yekrêziya kurdî encamine hêja û bi nirx anîne holê weke: Hevbendiya Dimokrat a Kurd li Sûriyê ya li sala 1986an hatibû avakirin, .....Diwem, Partiyên tevgera kurdî bi hev re, karîbûn di sala 1990 î de derbasî hilbijartinên perlemana Sûriyê bibin û di encamê de sê berbijêrên xwe bigihînin perlemanê.... Ji hêleke dî ve, di sala 1991ê de, piştgiriya serhildana Kurdistana başûr kirin, ji miletê kurd li rojavayê kurdistanê, alîkariyên diravî, cil û xwarin civandin û ji wan re rêkirin... Mînaka sêyem encûmena (Tevaya Partiyên tevgera Kurdî ) bû, di serhildana Qamişlo sala 2004 ê de, karîbû serkêşiyê bike û alîkariyê bi malbatên pakrewan û birîndaran re bikin. Çarem, di şoreşa Sûriyê de Encumena Niştimanî Kurdî hate damezrandin û bi Encumena Gelê Rojavayê Kurdistanê re Desteya Kurdî a Bilind damezrandin û di rêkefta Dihokê de jî Lêvegera Siyasî ya Kurdî hate avakirin. Bê guman, ew gavine balkêş û rewa bûn bo xizmeta doza gelê Kurd, lê mixabin berdewam nekirin û rawestiyan, hêviyên ku milet li ser wan girêdidan, li ber bayê sedemine ne rewa çûn, di serê wan de ezezîtiya partiya bû.

Eger, em xwendineke zanistî û siyasî, lê bikin, bi gelemperî em dikarin di hundurê çend xalên sereke de van sedeman bidin xuyanîkirin:

1- Bikaranîna çanda karên tekane û berberiyê ji dêvla karê tevahî û mil li mil... Her aliyeknemaze yên xurt- dixwaze bîr û boçûnên xwe bibê serî, da bikevê xizmeta berjewendiyên wî yên kesane, an jî yên partiyan e de .

2- Nepeydabûna rêveberiyeke lêhatî û çalak, da kar û xebatê di ber armancên vî karê hevbeş de bike, ev xal bi xwe cihê metirsiyeke mezin e, dema ku ev rêvebirî lerz û sist be, tu carî hêvî li ser nayêne girêdan, û wê tu qizincan jî bi dest nexe.

3- Hêz û şiyanên heyî naxin cihê xwe yê lêhatî de, da bikeve xizmeta armancên karê wan de, endamin ji wê komîtê dimînin bê kar , di encamê de serêş û astengan di pêşiya hevkarên xwe û karê hevbeş de, çêdikin.

4- Gelek caran, jimara komîta rêvebir bihtir e ji ku tê xwestin, dibe ku ji her aliyekî endamek be, wilo pilan di bin masan de tên hûnandin, tenê mebest ku kesê çalak û jîr di wê komîtê de ji cihê biryarê dûr bikin, em gelek mînakan jî dizanin û me dîtine.

5- Peywendiyên di navbera komîtê bi xwe de, qels in, û di asta herî kêm de ne, ji ber wê jî, nabin yek dest û yek dil li hember cîbicîkirina hêviyên milet, lê berûvajî vê, û ji bo rehên berberiyê xwe berdin xwar, pilanan dihûnin, di encamê de kar li bin guhê hev bikevê.

6- Destêwerdan û pilanên derve, da ku van aliyan berdin pêsîra hev, çi bi piştgiriya siyasî an jî ya diravî; bêbaweriyê di navbera wan de biçînin, da qels bibin, û tim hewcedarî .......

⓫

# Ji Tûrikê Kurdekî-2-

**Merwan Berekat**

Maseya çarkoşeyî çendî rengê wê xwînî be, çendî koşeyên wê çavsoriyan li hev bikin, çiqas kîndarî, zikreşî û çavberjêrî di wêne û rengên wê de hebin, ewqas ne pirsgirêk û sînor in, nemaze eger derfetê ji Kurdan re çîk da û hin çirûsk jeniyan, pir zûka maseya çarkoşeyî bi pîlan û nijadperestiyê çalak dibe.

Ev maseya ku koşeyeke wê rêjîma Tirkiyê yê ku ji sed salî ve û berî wê jî sultanên Osmanî bûn, bi sedan komkujî bi serê gelê Kurd kirine û hîn jî berdewam in. Koşeya diduyê rêjîma Îranê ya olperest û berî wê jî dewleta Sefewî beşek ji Kurdistanê ji xwîna gelê Kurd têr kirin, û ta niha jî yek hefte derbas nabe ku xort û keçên Kurdan bi destê rêjîma Îranê ya dijî mirovahiyê tên dardakirin. Koşeya sisiyê Helbçe û komkojiya Enfalê bi destê wan bû, û hîn jî destlatdarên Îraqê eger fersendê bibînin, ewê koka gelê Kurd wînin. Koşeya çarê rêjîma Elbe`s a Sûrî ye, ya ku bi hemû pilanên xwe hewil dida û ta niha jî Kurdan tune bike ye. Vêca ji çend salan û vir de koşeyeke din li vê maseyê zêde bûye, ew jî ``Itîlafa Sûrî`` ya ku xwedî mejiyekî tundrew û nijadperest e. Yanê eger ew bigînin destlatdariyê, tucarî ne kimtirî çar koşeyên din e. Belê, çendî mar nerm û reng xweşik be, lê dema ku xwe li ser piştê teqle dike ji mirinê derbas be tiştekî din nade.

Di serdema nûjen de piraniya derd, kul, bobelat, qirkirin û hewildanên tunekirina Kurdan di



bin serê maseya çarkoşe de ne. Vêca tiştê seyr û mixabîna mezin ew e, ku pir caran tevgera siyasî ya kurdî bi koşeyên vê masê tê xopandin, û herçar koşeyan mîna hev nabînin…!!! Eger bigotana koşeyek ji ya din xerabtir û rengxwînîtir e, ew gotin dê rast ba, lê tucarî çênabe were gotin ku koşeyek ji ya din çêtir e.

Tiştê seyr û pirtir bala mirov dikşîne û jê şêtûmêt dîmîne, çima Kurd bê maseya navxweyî ne….??? Dêpîra min digo: Eger çar mirîşk bibin yek, ew dikarin bi nikilan marekî bikujin, û eger çar şêr ne li hev bin, çeqelek dikare wan bixopîne.

---

# Silavek ... Ji Kobaniya Qehreman

**Arif Hiso**



Piştî nêzîkî sê salan ji bobelat û berxwedana Kobaniyan a gewre, û piştî ku çembera dorpêçkirina dijwar ji ser wê hate şikandin, û çûnhatina di navbera Kobaniyê û Cezîrê de serast bû, kobanî li bendê bûn û hîn jî li bendê ne ku rewşa jiyana xelkê wê yê qehreman baştir û hêsantir bibe. Lê mixabin li bervajî wê, hin biryarên çewt û kiriyarine neberpirsiyar li ser xelkê me dimeşin, nemaze di warê rewşa bazirganiya di nav bera Cezîr û Kobaniyê de. Ji bilî wê, karmendên ku di rêvebebiryê de kar dikin jî, piraniya wan ne pispor in û bi ser de (xal û xwarzêtî) jî peyda bûye. Malên wêrankirî ne hatin avakirin. Bac û pere ji xelkê têne standin, gelek kêmanî di warê xizmetguzariyê de hene û tu karê bi rêkûpêk di ber de nabe… Gotin ew e, ku Kobaniya me ya birîndar pir dijwariyan dibîne. Divê rêvebirî û kesên xwedî biriyar bi xelkê wê re alîkar bin û pirsên wê çareser bikin. Bila Kobanî bimîne warê qehreman û mirovatiyê û derd û kulan

# Doseya Çalakiyên Boneyên Avdarê

Çendî heyva avdarê,heyva xişim û bêtaran, heyva şîn û xemgîniyê ye, ewqas jî heyva şahî û berxwedanê ye. Li Avdara Îsal jî, xelkê me yê Kurd li seranserî cîhanê rabû ser piyan û xwe pê da naskirin, çi di(8)ê Avdarê roja jinê ya cîhanî de, çi di (12,16) an de, û çi jî di (20 û 21) an di Cejna Newroza pîroz de. Ji wan çalakiyên ku gelê me pê rabûye, çalakiyên Partiya Yekîtî Ya Demokrat A Kurd li Sûriyê bûn.



1- Boneya Roja Jinê ya Cîhanê: Bi vê boneyê, PYDKS û bi taybetî rêxistina jinê ya partiyê gelek şahî, festival û komcivîn li seranserî kantonên kurdî û deverên ku Kurd lê dijîn lidarxistin

2- Boneya (12) Avdarê: PYDKS li Kurdaxê li gel pênc partiyên din ên Kurd( TEV-DEM, Pêşverû, PDKS, PYD û PYNA) seredana goristanên pakrewanan (Şehîd Seydo û Metîna)kirin, her weha li Cezîr û Kobanê jî çalakiyên weha hatin kirin.

3- Boneya (16)î Avdarê: Li gor daxuyana Hevbendî seknek (5) kêlîkan bi awayine cubecur hate pêkanîn.

4- Newroz: Li roja (20)an êvarî, agir hatin dadan û şahî hatin lidarxistin.

5- Li roja Newrozê 21ê Avdarê û li dû wê jî, gelek şahiyên bi coş û mezin, li Xwezayê û di holan de, li derveyî welêt û li hundir hatin li dar xistin .

Tiştê herî xweş ew bû ku hemi çalakiyên Avdarê li welêt û derve bi aramî û rehet bi dawî bên.

---

**Silavek ... Dûmahîk**

ji ser xwe bavêje.

* Bi destpêka meha AVDARê re, û di çarçoveya çalakiyên Cejna Jinê de, Rêxistina Kobanî ya partiya me Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê, li roja Sêşemê 7 \ 3 \ 2017 an, semînereke li gundên Pêndir, Sêrket û Til Xezalê li darxist. Hejmarek mezin ji jinan li komcivînê baeşdar bûn. Di komcivînê de li ser guherînên siyasî yên dawî ku li navçeyê bi giştî û Rojavayê Kurdistanê bi taybetî çêdibin hate rawestandin, girîngiya rola jinê di civakê de da xuyakirin, û têkoşîna



şervanên jinên kurd di çeperên şer û parastina herêmên Rojava de bilind nirxand. paşê heval Şahîn Henîfî li ser rewşên ku Rojava tê re derbas dibe axivî, û li ser pêwîstiya parastina destkeftiyên ku bi xwîna keç û lawên me ji YPG, YPJ hatine qezenckirin sekinî û bilind nirxand. Pişt re, hin gotin û pirs ji hêla hin hevalan li ser wan xalan hatin kirin û bersiv hatin dan û şirovekeirin.

* Ji bo bîranîna pakrewanên Serhildana 12 Avdarê/2004an, û yên kîmiyebarana Helebçeya Şehîd li 16/31988an, rêxistina Kobanê ya PYDKS û dost û alîgirên partiyê, ligel xelkê Kobaniyê, li serê rê û kolanan sekinînin, pênc xulekên bêdeng rawestiyan. Bila bimire şofenîst û nijadperestî.

# Rêzdar Entonyo Gutêrêz Çû Seredana Herêma Kurdistan Îraqê

**Rozad Elî**



Li roja 30î heyva Avdarê, sekretêrê giştî yê Yekîtiya Netwan Entonyo Gutêrêz bi seredaneke fermî gihîşt Herêma Kurdistanê û ji hêla serokê herêmê rêzdar Mesûd Barzanî ve hat pêşwazkirin. Piştre civîneke fermî di navbera her du aliyan de li dar ket. Li gora daxuyaniya serokatiya Herêma Kurdistanê, Mesûd Barzanî ji Rêzdar Gutêrêz re xuya kir, ku bila tevahiya gelên cîhan dilxwaziya gelê Kurdistan û biryrara wî ya pêkanîna vepirsîna li ser paşroja wî nas bikin. Sekretêrê giştî yê YN jî spasiya Barzanî û gelê Kurdistanê kir, wekî ku digel hemî pirsgirêk û dijwariyan, wan bi sed hezaran mişextî li Kurdistanê bicih kirin. Wî hêzên Pêşmergeyan pesend kir, û wekî ku ew bi çek û kanînê hindik li hember hêzên têrorîst rawestîn û ew têk birin. Got jî, cihan bi dilxwaş û rêzdarî li rola Pêşmergan û gelê Kurdistanê dinêre û bilind dinirxîne.

Ji aliyê xwe ve, serokê Herêma Kurdistanê jî seredana sekretêrê giştî yê YN bilind nirxan û got ew cihê dilşadiya gelê Kurdistanê ye. Alîkariya mişextiyan jî erkekî welatî û mirovanî ye, û di bin çi nîr rewşê de bû jî gerek bû me bikira û me kir. Barzanî li ser pevçûnên di navbera Pêşmerge û Daişê de jî axivî û got “ji me re srbilindî ye ku Têror li ser destê Pêşmergeyan têkçûn”.

Serok Barzanî spasiya xwe ji hêzên Hevbendiya Navdewletî û YN kir, û hemahengiya di navbera hêzên Pêşmerge û artêşa Îraqê de jî pesend kir û wek egera bingehîn ji serkeftina li hember têrorê de dît.

Li derbara paşeroja Herêma Kurdistanê jî, Barzanî dupat kir ``ku vepirsîn dê di mandeke nêzîk de bê kirin, daku tevaya cîhana dilxwaziya gelê Kurdistanê û biryara wî ji bo çarenûsa wî nas bike``.

Li gora alavên ragihandinê, serokê Herêma Kurdistanê Rêzdar Barzanî ji sekretêrê YN gotiye: Bila win ji me bibihîsin, emê di demek nêzîk de vepirsînê (rerendom) li dar bixin, emê kêfxweş bin ku win ji vê dilxwaziya me bi erênî têbigihên``.

Ji hêleke din ve, li roja 2/4/2017an nivîsgehên siyasî yên her du partiyan Demokratî Kurdistan û Yekîtî Niştimanî Kurdistan bi amadebûna serokê Herêmê M.Barzanî li hev civiyan, û tê de biryara vepirsîna ji bo serbixwebûna Herêma Kurdistanê dan, û komîteke hevbeş jî ji bo birêvebirina karûbarên wê avakirin.

# Giringiya rêxistinê

**Nazdar Hesen**

Di jiyana mirov de rêxistin roleke pir girîng dilîze , ew ji serdema seretayî de dest pê dike û ta roja îro jî berdewam û xurtir dibe .

Tenê bi rêxistinê , mirov dikare hemû kar û barên xwe bi rêve bibe , têkiliyên xwe yên rojane bi derdorê re durist bike û



xwe ji kiryarên tewş û ji tevleheviyê jî biparêze . Bi vî awayî , mirov dikare demê xwe bi nirx biborîne û di demeke kurt de jî armancên xwe bi cih bîne .

Ji ber ku rêxistin destnîşana pêşketinê ye û serkeftinê jî diyar dike , hemû rêxistin, sazî, partî û komele li ser bingehek rêxistinî têne avakirin û dibe sedema berdewamiya wan jî, lewre pêdiviya her mirovekî bi rêxistinê heye, ji ber vê yekê jî, ew di jiyanê de weke pêwîsteke bingehîn e .

Lewre çiqas jiyana mirov bi rêxistin be, ew qas jiyana wî bi rêk û pêk dibe, ji ber vê jî, divê em hemû xwe bi rêxistin bikin taku em xwe ji tevleheviyê rizgar bikin û derfetên giring jî ji dest me nerin.

# Ji Rûpelên jiyana Jinê

Vejîna Kurd

Di civaka Kurdî de têgeha "jin" herdem bi jiyanê ve hatiya girêdan, ji ber ku jin sembola afirandina jiyanê û berdewamiya regeza mirovahiyê ye, lewra ew gelek pîroz tên dîtin. Birastî ez naxwezim li ser vê babetê pir rawestim, lê dixwezim pirsekê bikin: Ma gelo eger Xwedê jinek ji anîna zarokan bê par hîştibe, çima civak bi tevahî bi çavê nerazîbûnê li wê rebenê dinêre û bi hemû şêweyan tundiyê lê dike? Di civaka me de, jina ku xizmeta mêrê xwe bike û gelek zarokan bîne dinyayê jineke baş e, û ya ku nikane zarokan bîne weke jina nebaş pênas dibe, ango civak jinê weke hebûneke ku bi qasî hejmara zarokên aniye dinyayê hêja dibîne, û bi vê helwestê, dayikbûn, weke rêya rizgariya ji zext û zordariya civakê li pêşiya jinê dimîne. ZordaRiya li dijî jinan û şêweyên wê naskirî ne, lê hema jina ku zarokan nîne tûşî pestên piralî dibe, ji aliyekî ve zordariya ku ew weke jin di civakeke şûndemayî de dibîne, û ji aliyekê din ve êş û kovanên wê ji ber pirsgirêka wê ya derûnî ku ew ji xweristiya dayikbûnê bê par maye, bêguman civak, bêtir jî jinên wê civakê, roleke neyînî dilîzin, wê jinê nefret û riswa dikin, bi gotin û helwestên xwe wê dêşînin û di rewşa herî baş de mêr pesend dikin ku careke din bizewice û bi zarokên ku ji bedena xwe şa bibe. Tiştê herî seyr ew e ku eger sedema çênebûna zarokan ji aliyê mêr de be, jin bi qedera xwe razî dibe, jiyana xwe bê zarok didomîne û tucarî berdanê naxweze û civak jî bêdeng dimîne, lê eger jin nikanibe jiyana zewacê bi anîna zarokan bixemilîne, bêguman mêr zewaca duyem weke çareserî ji vê pirsgirêkê re dibîne, civak jê re dibe alîgir û piştgir û dibêje ev mafekî rewa ye.. Eger mêrek sê-çar caran zewicî be û zarokên wî tune bin jî, dîsa ew jinên xwe tewanbar dike û kêmasiyê di mêrantiya xwe de nabîne!! Belê.. di civaka me de ev rûdawa pir tê dîtin, û em



kanin rewşeke din, ku nêzîkî wê ye, bînin zimên ew jî derd û kulên dayika keçan e (ew jina ku hemû zarokên wê keçik in) di vê rewşê de dîsa mêr pişta xwe dide ol, urf û adetên civakê yên kevneşop, û bi zewaceke dî dirame, tevlî ku hemû pêşketinên zanistî diçespînin ku mêr berpirsyarê zayenda "cenîn" e. Di heman demê de em kanin bêjin ku ev helwest û nerînên han, ku di nav hemû pêkhateyên civakê de tên dîtin, şêweyek ji zordariya li dijî jinê ye û mixabin bêtir bi destên jinan gur dibe, ew jinê miroveke nenas, bê hal û bê hêz dibîne, ku kişwera wê mal e û çalakiyên wê yên herî astbilind çêkirina xwerinê û anîna zarokan e.. Bi ya me be ev durûtî di şêweya danûstandinê bi jin û mêr re seknandineke kûr li ser bîrûbawerî, urf, adet û nirxên civakê divê.

# Çalakiyên Cejna Jinê ya Cîhanî

Bi boneya Roja Jinê ya Cîhanî, Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd li Sûryê bi gelek çalakiyên fere li welêt û li derveyî welêt şahî û rêwresmên wê li dar xistin. Bi sedan jin û keç li komcivîn û ahengên ku ji hêla rêxistinên partiyê ve hatin lidarxistin amade bûn û cejna xwe ya salane şên kirin. Gelek partî, rêxistin û saziyên civakî lê amade bûn û axaftin û gotarên xwe kirin û hest û nêrînên xwederbirîn. Rêxistina partiya me li herêma Efrîn jî gotineke nivîskî li ahengên ku li Çiyayê Kurmênc li dar ketin xwend, tê de li ber rewşa jina kurd û sûrî rawestî, nêrîn û bîrbaweriyên xwe gotin û cejn pîroz kir. Gotina partiyê wiha dest pêkir :

**Xwîşk û birayên hêja !……**
**Mîvanên rûmetdar….!**

Ji roja roj de, di her civakekê de roleke jinê berbiçav û taybet heye. Ew mil bi mil di her şîn û şahiyekê de li gel mêr bûye .Lê xwedîlêderketina civak û destlatan li mafên wê yên rewa, ne li gor erk û stubariyên ku pê radibeye. Ne tenê weha jî, li pir ciyan tê binpêkirin û çewsandin jî. Zor û zordariya jina Sûriyê di van şeş salên kirîza em tê de, ji kuştin penaberkirin, zîndankirin, ……û H.W.D nimûneyeke balkêş e. Lê dîsa jî wê xwe radestî qederê nekiriye, û bi her awî berevanî kiriye, Rezan Zeytûne jî mînakeke ronak ji xebata jina Sûrî ye. Di vî warî de, em dibînin çawa jina Kurd –weke beşek ji jina Sûriyê û Kurdistanê - ew jî bi hemî hêz û vîna xwe, - bi baweriya ku azadiya …….

10

# BAREKÎ GIRAN...LI XWE VEGERE

Îlham Osman

Perwerdeya zarokan barekî giran e li ser milên dê û bavan. Hewil didin ta ku wan di hembêzeke banok de tîmar bikin, ji dijwariyên jyanê jî biparêzin, û di heman demê de jî, wan fêrî hêz, aramî û hişmendiyê dikin...

Bêguman ustubariya giran li ser milê dayîka ye, ji ber ku ew demeke dirêjtir bi zarokên xwe re dimîne... Dîroka dayîkên kurd,cihê şanaziyê ye, li rex karên mal, çol, anîndina û perwerdeya zarokan, wan bi pêdarî jiyana xwe berdewam dikir. Ango zarok û malbata wê xêzeke sor bû, û çênabe tu bijartin li ser wan hebe... Ev rastiya di gotinên dêpîrên me de diyar e, hertim li ser zext û tundiya mêr û karan diaxivin... Di van rewşên aloz de, û ji encama şorşeke bê dad de ku bi ser milet de hatiye, bandorên neyînî li malbat û kesan kiriye, û têkiliya mirovan xistiye nav gumaniyê, û ji rûdanên ku em dibînin, û bilindbûna rêjeya berdanê, digihêjin encama ku



ezezî ketiye hestên hin dayîkan!!! Gelo çima em ji xwe pirs nakin, çima ji berî 20-30 salî de, û tevlî dijwariya jiyan dêpîrên me, bi jimêrberdanê nediponijîn?!!! Eger em hevsengiyekê di rewşa berê û niha de çê bikin, em ê bibînin ku piraniya pêwîstiyên jiyanê li ber destê dayîkan e. Lê tiştê ku balan dikşîne ew e, ku hin dayîkên civaka me, û bi bihaneya ku ew jineke zorkêş e, û ji xafilbûna wê ji bîr dike ku gava dest ji malê ber dide, zarokên bê sûc toşî windabûn, zilm û tunduyê dike!!! Ji mafê dayîka ye, ku nêrîn, azadî, helwest û biryarên wê bên rêzgirtin, lê rastiyek heye divê hemû dayîk lê haydar bin (Gava tu dibî dayîk, azadî û jiyana te bi zarokên te ve tê girêdan) lewra berî hilweşandina têkiliyê malbetî, careke din li xwe vegere...

Mixabin em weke jin li hemberî rewşên aloz û çepfitlandina jiyan xwe jar in, ji ber ku zanabûna me ne di asteke bilind de ye, û xwehezkirin di derûnên me de vedije, zêdetir em bi hestên xwe berve pirsgirêkan diçin!!! Tevî ku rewşa her malbatekî ber çav dibin, lê bi gelemperî pir jinên me bi destê xwe jiyana xwe û zarokên xwe dixin metirsiya xerakirinê!! Jiyana dêpîrên me mînakeke balkêş e, di gel karên berê weke şixire, palî, çandinî, xwedîkirina sawalan, û zordariya mêrên hiştund, kenê zarokên wan dibû dermana her êşekê... Divê di lehiya guherînên jiyan xwe de noq mebin, lewra bang li dayîka ku di demeke dînok, lezok û tewşan de dikin, berî ku tu gavan bavêje dervayî malê, li ser milê çepê vegere, û li rondikên ku di çavê kezebên te de dizên meyze bike, belkî qeşaya ku li ser dilê te girtiye bihele.

---

**Çalakiyên ... Dûmahîk**

welêt ji azadiya jinê cuda nabebeşdarî xebatê dibe. Lewre ew bi hişmendî berevaniya hebûn û azadiya welatê xwe dike, û ji bo serkeftina doza miletê xwe,ew di hemî warên jiyanê (siyasî, aborî, civakî rewşenbîrî, leşkerî…û H.W.D) de têdikoşe û serkeftinên mezin bi dest xwe ve tîne .

**Beşdarên birêz !.....**

Xebata jina Kurd, xebata gelê Kurd e û pêşketina wê pêşketina civakê ye. Em Bi hêvî ne, ku her jinek vê stubariyê bide ser milê xwe û bi bîr û bawerî û rêxistinkirî tevbigere û rola xwe di civaka Kurd de bilîze .

Bi navê rêxistina jinê ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê li Kurdaxê, em (8)ê Avdarê (roja jinê ya cîhanî ) li tevahiya jinên cîhanê pîroz dikin, û li ser vê bingehê jî, em giyanên hemî jinên ku bi mebesta jineke wekhev û azad jiyana xwe ji dest dane ( wek Leyle Hesen Qasêm, Arîn Mîrkan, Rewşen Bedirxan, Eyşeşan, Fîdan Doxan û her du hevalên wê, …û h.w.d) bi rêz û rêzdarî bi bîr tînin




û silav dikin .

*-Heyştê Avdarê li hemî jinên cîhanê û bi taybetî li jinên Kurd û Kurdistanê pîroz be .*

*-Bijî xebata jina Kurd .*

**Rêxistina jinê ya P.Y.D.K.s – Kurdax**

**Bi yekîtiya me … Dûmahîk**

baweriya hevalbendên wê jî pê tê, û doza gelê Kurd ji destê dewletên herêmê derketiye û bûye dozeke navnetewî, ewê li gora yasa û prensîpên rêxistina Yekîtiya Gelan(UN) çareseriya xwe bibîne.

Vêca, di vê heyam û qonaxa hestiyar de, ji hemû aqilmend, siyasetmedar û rewşenbîrên dilsoz ên Kurd tê xwestin ku ew bê westan bixebitin, bi erk û ustûbarên xwe yê netewî rabin, berî her tiştî, avekê li vî agirê bi mala Kurdan ketiye bikin, li dijî şerê ragihandinê yê di nav biran de gur bûye dengên xwe hildin û wan alavan ker û lal bikin, û ji bo çareserkirina nakokiyên heyî, hemû bi hev re li rêyên hevdîtin û gotûbêjê bigerin û nehêlin armancên neyarên doza me bi cih bibin. Bila em hemû bizanin ku doza Kurdî ne tenê doza partiyan e, lê belê ew doza hemû beş û qatên civakê ye, û hemû di destnîşankirina çarenûs û paşeroja keç û lawên xwe de mafdar in.

Em di wê baweriyê de ne ku çendî em hevgirtî û yekdest bin, ewçend dema azadiya gelê me nêzîk dibe, rê li ber pêşveçûna wî dûz dibe, Newroza me şêntir û geştir dibe.

Mirin û neman ji terora cîhanî, ji raman û çanda tund û tûjiyê re.

Bijî NEWROZ, nîşana aştî, azadî û wekheviyê.

**Karê Hevbeş ...Dûmahîk**

wan bin, an li gor berjewendiyên wan hezên derve bin .

Bê guman sedmine din jî hene, lê ev yên sereke bûn....

Neveşartiye ku ev sedemên jorîn, hemû li bejna karên hevbeş yên tevgera kurdî li Rojavayê Kurdistanê tên!...

Gelê kurd bi gelemperî û bi taybetî tevgera wî ya siyasî, hewcedarî çanda karê hevbeş e, ew karê ku pêwist e liv di ber armancên wî de bibin – di encamê de- ew armanc û hêvî wê yên gelê kurd bin.

---

**Ji Hevdîtineke Giring … Dûmahîk**

Raporên ji hin aliyên bawerdar û gelek navendên bêlayan de derdikevin û wan buvehiyên ku we di pirsa xwe ya rewa de çêrê kiriye dest nîşan dikin. Erê em bi vîn û vebjarên gelê Herêma Kurdistanê re ne, lê vêketina şerekî xwînî di navbera vê hêzê û wê hêzê de karekî cihê şermezariyeke giştî ye….. hemî gotar û sozên ku ji xelkê re tên dan û gotin, li pêş êş û bobelatên ku şêniyê Şengalê dîtine û şerê qirkirinê ku ji hêla Encûmena Mafên Mirovan ve wek Cînosîd hatiye binavkirin, pir biçûk dibin. Wek em zanin komkujî çêbû, jin û mêr hatin dîlkirin, gund hatin şewtandin, bi deh hezaran xelk mişext bû û hîn çarenûsa sê hezar jin û zarokên ku di destê DAIŞ de ne jî ne diyar e…. ew hemî dupat dikin, ku gerek hemî hêz û aliyên kurdistanî, destlatên xwecihî, herêmî û navdewletî jî karên xwe bi hêz bikin û bikin yek, xelkê Şengalê biparêzin, pêdviyên jiyanê ji wan re peyda bikin, tirsa têror û nijadperestiyê ji ser wan bidin alî, rêza vîna wan bigirin, di avakirina gund û bajarokên wan de alîkar bin û kesên mişxtbûyî vegerînin warên wan.

Taku bûyereke şermdar mîna ya Xanasorê ku di navbera hêzê Leşkerê Roj û hêzên parastina Şengalê de dubare nebe, û dîsa qurbanî nekevin…. em ji bilî zimanê dialog û hevpeyvînê rêne din nabînin, ne hîn ji hev bibin, dest bavêjin hêzê û çekan û nakokiyan bi şer çareser bikin!.

***Pirs**: Piştî çend salan ji temenê Rêvebirya Xweser, win wê mînakê ji aliyên aborî û geşepêdanê de çawa dinirxînin? Û têkliya wê- wek tê gotin- bi destlata sûrî re çawa ye?*

Sê sal di ser mînaka Rêvebirya Xweser re derbs bûne. Di van salan de dijîtiyeke mezin pê re hate kirin, navçeyên wê dorpêç bûn, kelûpel kêm bûn, çûnhatin asteng bûn, gundên bersînor û şêniyê wan ji hêla sînorê Tirkiyê ve tûşî çureyên cebilxane û topan dibin, di encamê de bi dehan kuştî û birîndar li navçeyê Efrîn, Kobanê û Cezîrê bûn qurbanî. Lê digel wan rewşên dijwar, tevgera damezrandin û avakirinê ranewestî, li bervajî wê, karekî avakirinê yî berçav li wan her sê navçan û gund û bajarên mîna Qamîşlê, Dêrikê, Efrîn û hwd rabûye. Ji aliyê çandiniyê de jî, çandina genim, cureyên tene, darûber bêtir bûye. Kargehên cilan ên biçûk têne vekirin û li benda alîkariyê ne. Destlata Şamê jî, hîn mehaneyên bi deh hezaran karkerên ku di saziyên wê de kar dikin û yên ku teqawîtbûyî jî dide. Ew rewşa li hemî parêzgehên Sûryê heye. Lê belê destlat ji ferebûna rola Rêvebirya Xweser û Hêzên Sûrya Demokrat ditengije, nemaze jî gava ew alîkarî û piştgiriyê ji Hevendiya Navdewletî bi serkêşiya Emerîka Yekbûyî û Rûsya Federal dibînin…

Dîroka gundekî:

# Gundê Xuşêniyê

**Wergêr:**
**Mihemed Zekî Mihemed**



Ji ber pirbûna şînahî û darên meyweyan li dora gund û xurista wê ya dilervîn bi Xuşêniyê hatiye bi nav kirin .

Li gorî dabeşkirina hikûmeta Sûriyê, ji hêla rêvebiriyê ve bi Qeza Çila Axa ve girêdayî ye û dora (25) km an jê dûr e, û dora (22) km an ji Tirbespiyê dûr e.

Xuşêniyê ji hêla Başûr ve sînordarê gundê Ereb Şah, ji hêla Bakur ve sînordarê gundê Şêtika ye, ji hêla Rojhilat ve sînordarê gundê Tokil û Ele qos e, ji hêla Rojava de jî sînordarê gundê Me`şoq û Babasiyê ye.

Hozên gund: Hoza (Quling û Şimxalka) ya ku damezirênera gund e, hejmara malên wê dora (15- 16) mal bûn, di qunaxa diwan de gihişte (34) malan û niha (30) mal bi tenê mane. Piştî sala 2011an tu avkirina nû lê nayê dîtini, û ta niha hoza(Quling û Şimxalka) tevî hin hozên din li gund cîwar in. Ji hêla olî de, şêniyên gund hemû misilman in .

Giringtirîn cihên şûnewarî di gund de:Ji hêla başûrî rojhilat ve (Kaniya kûr) lê heye, keviyên wê ji wan kevirên ku gund bi xwe ji kevn de bi wan hetiye avkirin, avakiriye, û girekî axî ku di bin keviran de maye heye, bi (Kêla Ni'uman) tê binavkirin. Di van salên bûrî de, çemek ji hêla bakur ve diherikî, lê niha ziwa bûye û tenê çemê gund maye, ew jî bi ava kaniyên gund çêdibe. Du kanî li gund hene mizgefta gund li ser yekê ji wan e, di navbera gund û gundê (Ereb Şah) de li hêla başûr gelek aşên ku li ser keviyên çem yê rojhilat û rojava û bi ava çem digeriyan hene, lê niha winda bûne.

Gitingtirîn xizmetguzariyên ku li gund peyda dibin: Yekemîn dibistan ji xweliyê ji hêla gundiyan ve di sala (1961) ê de hate avakirinê paşê di slala (2011)an li şûna wê yeke pîşezakirî hate danîn, telîfon ji sala (2001) ê ve gihane gund. Li bakurê gund rêyeke qîrkirî heye gund bi Girkê Legê û Tirbespî yê ve girê dide.

Xakên çandiniyê: Rûbera xakên çandiniyê dora (2500) donim e, di projeya zinara Erebî de (1070) donim ji hêla hikûmeta Sûryê ve hate desteserkirin û li Erebên Xemir hate belavkirin .

Di sala (1977) an de fermaneke di derbarî parêzgeha Hesekê de derket, naveroka wê ev bû: "Xakên ku kevir û dar û spîndar têde hene, arziya wê li cotkarên kevn vedgere" derçû, ji loma cotkarên gund li pey doza xwe çûne, lê belê hate erêkirin ku wan xakan bi kirê bidine wan. Lê paşê ew li Erebên Xemir vegerandin.

Giringtirîn çandinî: Berê ceh, genim, spîndar û darên bi ber mîna: Xox – Zerzere – Hejîr û Tirî) dihatin çandin û niha ( Kemûn û Kizbera "Gijnij" li wan zêde bûye, lê çandina daran ji hêla gundiyan ve hate piştguhkirin .

Giringtirîn lawir: Ji berê de iwanga, hesp, hêştir, çêlek, pez, mirîşk û balinde xwedî dikirin, niha tenê (çêlek, pez, mirîşk û balinde), tênê xwedî kirin

Giringtirîn Bûyerên dîrokî: Di sala (1989)an de pevçûneke di navbera gundiyan û Erebên Xemir de qewimî, ji encama wê bi rêjeyeke mezin xakên gundiyan hatin desteserkirin ... ...Bi kurtahî ji rûpela Çar Çira ya fêsbûkê.



**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de**

**Êmêla Newrozê:**
**Newroz@yek-dem.com**